 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 25

# Pêşiyên Kurdan
# Sûmerî: Warê wanî bingehîn li kû ye?

### Çar kelahên pîroz:

Bi rastî, ne tiştekî suriştî ye ku neteweyek bi dirêjahiya 25 sedsalan wisa bimîne, ku welatê wê dagîrkirî be, ji dîrok û bermaya xwe bidûrketî be, ji nasnameya xwe biyanî be, ketibe bin projeyên nixumandin û asîmîlekirinê yên here hov û hîlebaz, û projeyên çepelkirina nav û dengê wê, çewsandina wê, awarekirin û qirkirina wê û bi mebest hiştina wê di nezanî û xizaniyê da.

Neteweyeka bi vê rewşê, dê çawa kanibê bîreweriya xwe ya niştîmanî û neteweyî biparêze? Çawa wê dîroka wê ji wendakirin, pêlîstin û xwarkirinê sax bimîne? Çawa wê dot û lawên wê ne nezan bin derbarê her demekê ji dîroka wê ya neteweyî? Çawa ewê nebin maşe û destik ji bo xizmetkirina neteweyên ku welatê wan dagîr kirine? Çawa wê hinekên din jî ji wan wê nebin mejî-şuştî û nebin dijminên neteweya xwe?

Eve rewşa neteweya Kurd. Ev rewşeka pir awarte ye û divêt bi her awayî êdî bê bidawîkirin. Heger ne wisa be, hîngê pejirandina mirovê Kurd ji vê rewşê ra tê maneya ku ew êdî dest ji mirovatiya xwe berdide. Me berê jî gotibû ku çar kelahên pîroz hiştin ku neteweya Kurd zindî bimîne, û bi wan ew derbas sedsala bîst û yekan bû wek gelekî xwedî taybetmendiyên cuda, û piraniya wan li welatê xwe Kurdistan bimîne. Ev kelah jî evin: Çiyayên me yên bendevan, dayîkên me yên berhemdar û çandeparêz, şoreşgerên me yên qehreman û payebilind, û çembera me ya êlîtî, gundîtî û şivantiyê.

Nezanîna me derbarê vî şaxê pêşiyên me Kurdan - mebesta me Sûmerî ne - encama vê rewşa meya kurdistanî awarte ye. Pêş ku em li rastiya wan bikolin, divêt em bînin bîra xwe û hesabê wê yekê bikin ku em didin pey şopa jînenîgariya gelekî ku dîroka wî vedigere ser dema dawî ya heyama kevirî-madenî. Ev heyam li başûrê Kurdistanê bi her hal dikeve nav salên 5500 - 3500 b.z.[1]

Di wê demê da hên gel nebûbûn komên neteweyî, û komeka bi navê neteweya Kurd, yan neteweya Faris, yan neteweya Ereb, yan neteweya Ermen, yan neteweya Turk, yan neteweya Yûnan, yan neteweya Alman, yan jî neteweya Firansî wê hîngê hên tinebû. Ew heyam ew dem bû ku di wê da şaxên mezin peyda bûn ku di pey ra ji wan şaxan êdî netewe peyda bûn.


## Warê Sûmeran yê bingehîn:

Derbarê rah û koka Sûmeran bîr û bawerî pir û cuda ne. Navê wan ji gotina "*Şûmer*" hatiye. Ev nav, navê kevin yê herêma başûrê Mêzopotamiya ye (başûrê Îraqa niha). Di pey ra, ev nav bi şêwazê "*Sûmer*" hate belav bû. Sûmeran bi xwe, ji welatê xwe ra digotin: "*Ki -en -gi*", yanê "*welatê serwer*", yan jî "*welatê serwerê mêşeyên qamûş (qamir)*"[2]. Lê belê pirs ewe, gelo Sûmerî ji kû hatin başûrê Mêzopotamiya? Li ser vê yekê bawerî ji hev cuda ne. Emê van baweriyan bi kurtahî bînin ber çavan.

Baweriyek heye, dibêje ku Sûmeriyan ji herêma çemê Sind yê navbera Pakistan, Afganistan û Belcistanê barkirine, û demekê li rojavayê Îranê bi cih bûne û ji wir di kendava farisî ra derbas Behrayn, bûne û hatine başûrê Mêzopotamiya. Behaneya xwediyên vê baweriyê ewe ku qermîtê sûmerî û nexşên wan dişibihe qermîtê deştên çemê Sind. Lê belê, di pey ra gotin ku ev bawerî ne raste[3].

Hinekan jî gotin ku Sûmerî ji bakurê Afrîka di Filestîn û Sûriyayê ra derbas bûne û hatine. Hinekan jî gotiye ku ew ji başûrê Hindistanê hatine[4]. Hinekan gotine ku ew ji Meceristanê (Hungariya) di Anatoliyayê ra derbas bûne û hatine herêmên jorîn yên çemê Ferat û di pey ra ber bi Mêzoptamiya çûne[5]. Baweriyeka din heye ku dibêje bapîrên Sûmeriyan ji nijadê Qefqasî ne, ew ji herêmên pişt çiyayê Qefqasê yan jî pişt Derya Qezwîn (Gola Hezar) hatine û di çarîkê dawî yê hezarsala çaran b.z. da hatine herêmên rojavayê Îranê û hin bi hin başûrê Mêzopotamiya xistine bin destê xwe[6].

Lê belê, piraniya dîrokzanan dibêjin ku Sûmerî ji herêmên çiyayê Zagros (warê piraniya pêşiyên Kurdan) hatine. Ji ber ku nexşeya dewleta Kurdistanê di nexşeya cîhanê da tineye, ew herêm li gor dewletên ku Kurdistan di navbera wan da hatiye beşkirin, dane naskirin. Dîrokzan *Amir Suleyman û Ehmed Malik El-Fityan* dibêjin: "**Baweriyên ku bêhtir ji yên din têne pejirandin ewin ku Sûmerî ji komên herêmî peydabûne, yên ku ji heyamên kevin da li Îraqê dijiyan û ew ne ji dervayî welat hatine; ew ji aliyê bakur hatine başûr**"[7]. Mebest ji "bakur" helbet bakurê Îraqê ye; yanê herêma başûrê Kurdistanê ye.



Dîrokzan *Georges Roux* Sûmeran dixe nav neteweyên ku ji çiyayên başûrê Kurdistanê koçkirine. Û dîsa dibêje ku rûniştivanên heyama "*Ubeyd*" hên pêş Sûmeran ji başûrê Kurdistanê hatine başûrê Mêzopotamiya, û dibêje:

"**Heger me qermît wek pîvaneka bi bawer pejirand, hîngê rûniştivanên "Ubeyd" wisa têne xuyakirin ku ew ji Îranê hatine. Lê belê, hin nîşanên din hene ku didin xuyakirin, ew bi her awayî li bakurê Îraqê di rêya "êrişvanên dîrokê" ra hatine û zagonên xwe li ser rûniştivan ji wan kevintir ferz kirine. Ji hêla din va, qermîtê bajarê Erîdû hêrzaneka wisa dide ku rûniştivanên kevin yên başûrê Îraqê, bi awayekî ji awayan vedigerin ser "Ubeyd" û "Helefiyên bakur"; wek ku ew du şax bin ji yek rah û kokê. Bi her awayî "Helefî" - ew jî bi xwe - divêt ji warên çandiniyê yên Heyama Kevirê Nû ji "Hesûne" û "Çermo" hatibin**"[8].

Mebest ji "*Ubeyd*" helbet "*Til-Ubeyd*"-e ku bi 8 km li rojavayê bajarê "Ûr" yê sûmerî dikeve (biner li nexşeya Sûmer). Dîroka heyama "*Ubeyd*" dikeve navbera salên 4500 - 4000 b.z. Dîrokzan *Jean Bottéro* û hevalên wî dibêjin: "**Wisa tê xuyakirin ku rûniştivanên wê (yanê Ubeyd) ji beşê herî başûr yê başûrê Kurdistanê hatine ku niha di navbera Îran û Îraqê da hatiye beşkirin û jêra "Loristan" dibêjin**"[9].

Til-Hesûne bi 52 km li başûrê Mûsilê dikeve[10], û warê dîrokî "Çermo" li nêziya Kerkûkê di erdnîgariya Kurdistanê da ye. Dîroka wî vedigere dor sala 6750 b.z. *Jean Bottéro* û hevalên wî dibêjin: "**Warê Çermo yê nêziya Kekûkê ji warên Kurdan yên herêmên bilind tê hejmartin û nimûneyeke ji warên here pêşîn û yekane**"[11].

Mebest bi "*Helefiyan*" rûniştivanên erdnîgariya "*Şaristaniya Helef*"-in. Bi me ra di babeta "**Pêşiyên Kurdan û gênên şaristaniya Guzana**" derbas bû ku peyva "*Helef*" li gor "*Til-Helef*" hatiye binavkirin û ev nav ji navê "*Girê Guzana*" hatiye erebkirin; ew li aliyê rastê yê çemê Xabûr, li başûrê Serê Kaniyê yê rojavayê Kurdistanê dikeve. Dîsa bi me ra derbas bû ku piraniya erdnîgariya vê şaristaniyê dikeve nav warê pêşiyên Kurdan.



(Sûmer û çiyayên Zagros)

Bi gelemperî em dikarin bêjin ku deştên Mêzopotamiyayê hên ji berbanga dîrokê da meydan û tirada dijberî û kefteleftan bû di navbera gelên ku ji biyabana erebî dihatin û gelên derdorên

çiyayên Zagros da bû, ew herêmên ku ji hêla rojhilat û bakurê rojava da herêma Mêzopotamiya hembêz dikin. Û Sûmerî û rûnşvanên başûrê Mêzopotamiya ên berî Sûmeran, ji destpêkên pêşiyên Kurdan yên çiyayî (zagros- Torosî) bûn ku hatin û li başûrê Mêzopotamiya bi cih û war bûn; ew welatê xwedîyê deştên fireh û pirav.

Çarşemb, 16.09.2015

## Jêder

[1] Gean Bottero û hinên din: Rojhilata Nêzîk, Şaristaniyên Destpêkî, rûpel 29. Fadil Ebdulwahid, Amer Suleyman: Xwerisk û adeteên gelên kevin, rûpel 12.
[2] Georges Roux: Îraqa Kevin, rûpel 119. Sami Se'îd El Ehmed: Sûmerî û bermaya wana şaristanî, rûpel 41.
[3] Ebduleziz Salih: Rojhilata Nêzîk û Kevnar, rûpel 449. Sami Se'îd El Ehmed: Sûmerî û bermaya wana şaristanî, rûpel 42.
[4] Tewfiq Suleyman: Lêkolîn li şarstaniyên rojavayê Asiyayê yên kevin, rûpel 78.
[5] Fadil Ebdulwahid Eli: Ji Sûmer ta bi Tewratê, rûpel 22.
[6] Ebduleziz Salih: Rojhilata Nêzîk û Kevnar, rûpel 449. Û binêre li Ehmed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 42.
[7] Amer Suleyman, Ehmed malik El Fityan: Semîner di dîroka kevin da, rûpel 75. Û binêre li Ehmed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 91.
[8] Georges Roux: Îraqa Kevin, rûpel 123.
[9] Georges Roux: Îraqa Kevin, rûpel 96. Derbarê heyama Ubeyd binêre li Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 19. Fadil Ebdulwahid Eli: Ji Sûmer ta bi Tewratê, rûpel 23. Taha baqir: Pêşgotin di dîroka şaristaniyên kevin da, rûpel 302.
[10] Hary sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 19.
[11] Gean Bottero û hinên din: Rojhilata Nêzîk, Şaristaniyên Destpêkî, rûpel 34.